

*Beyî karê me di vê dinê de tu çerx nikare vegere:  
Hêza me ya dinê sekinandinê û wê ji kokê guhertinê heye!*



## **Bangewaziya ji bo Greva Roja 8ê Adarê ya Navneteweyî**

8ê Adarê roja tekoşîna jinan a navneteweyî ye. Bi dehan salan e em ji bo tecrubeyên xwe û bînpêkirinên civakî, ku em her roj bi wan re rûbirû dimînin, bidin xuyakirin di vê rojê de derdikevin kolanan. Em jin in, lezbiyen in, ne-du alî ne, kesên trans û înter in û em beşên tevgerê navneteweyî ne. Ev tevger di salên dawî de ji Polon heta Arjantînê, ji New Yorkê heta Hongkongê, ji Îspanyayê heta Nijeryayê bi milyonan kesan derxist kolanan. Herweha di sala 2019'an de emê li Hamburgê û li hemî cîhanê cihê firaqsoyan tijî û kursiyên buroyan vala bihêlin: emê rabin ser xwe û grevê bikin!

Bi salan e em bi fikar bilindbûna partî û hikumetên rastgir dişopînin. Beramberê vê em her tim êriş û şîroveyan zayendperest, ên li dijî homoseksuel, trans û astengdaran dibihîzin. Rastî şidet, pêkutî û kedxwariya cis-mêran<sup>1</sup> û baviksalarîyê tîn! Karê me piçûk tê dîtî û nayê xuya kirin: Hîn jî em ji cis-mêran kêmtir û hindiktir qezenc dikin. Li malê em bi saetan karê malê, perwerdê, lênêrînê ku heqên wan nayên dayîn dikin. Dema em pîr dibin bi malnişîniya xwe nikarin debara xwe bikin. Weke tişteke xwezayî divê em her tim piştgiyariya hestiyarî bidin mirovên derdora xwe û ger pêwîst be pêdiviyên xwe şûn de bikişînin. Em cuda ne û em hemî xebatkar\* in! An pêûs an jî amûrê badanê, an komputer an jî melkis di dest de, an bi pere an jî bê pere: ji me tê xwestin ku em bê gilî û gazin, bê xem û bi daxwazî hemî van karan bi cîh bînin.

Emê roja 8ê Adarê bikevin grevê, da ku tiştên di nav çar dîwaran de wenda dibin, bîn xuya kirin û ji bo tecrubeyên me bibin xwedî dengê kolektîf, da ku tenê nemînin! Emê ji bo civakeke ku tê de herkes karibe pêdiviyên xwe bidest bixe û tê de bê tirs cudahiyê xwe nîşan bide, derkevin qadan. Lewre em naxwazin tevî sîstemeke ku tê de pêşbazî, cudakarî û kedxwariya ser mirov û derdorê serdest e, bibin. Em ji bo guhertineke bingeîn a civakê têdikoşin.

### **Em kî ne?**

Em gelek mirovên cuda ji aliyên cîhereng in. Em xwedî tecrubeyên cuda yên civakî û çandî ne. Hin ji me diçin dibistanê, hin ji me perwerdê kar dibînin. Hin ji me Hartz 4 distînin, hin penaber in an jî malnişîn in. Gelek kes ji me karê lênêrînê yê hestiyarî û fîzîkî yê bê pere ji bo derdora xwe digirin ser milê xwe. Karê perwerdê û malê bi rêxistin dikin. Em li malê dişixulin an jî di karên cûr be cûr de. Tiştê ku dê me bike yek hêza me ya hemî karên bi heq û bê heq di cîh de hiştine!

### **Em çi dixwazin?**

Ev grev ji bo em karibin tekoşînen cuda bigihînin hevdû û ji bo avakirina çalakkûna bi piştgirî û bi hevkarî derfetek e.

Em ji bo jiyaneke ku emê tê de li gorî hêzên xwe û pêdiviyên xwe kar bikin û hemî kar bi rûmet bîn dîtî, têdikoşin. Emê karê nayê dîtî û bê heq bidin xuya kirin. Emê çarçoveyan malbatî û tîkiliyan polîtîze bikin. Lewre ya taybet polîtîk e. Em dixwazin bi xwe biryar bidin, lewre her kêliya roja me dema me ye!

<sup>1</sup> Wekî cis-Mêr zilamên ku di zayina xwe de wek mêr tîn dinê û bi vî awayî ji xwe razî ne, tîn binav kirin. Trans-mêr jî mêr in, lê ne xwedî heman derfetan in û tîn bindest kirin.

Em ji bo karên lînêrînê yên wek lînêrîn, zarok mezinkirin û karê paqijiyê nasnameya civakî û nirxa materyal daxwaz dikin. Em li hember krîmînalîze kirina xebatkarên seksê disekin. Em ji bo civakeke ku tê de em hemî jiyaneke baş û ewle karibin jiyaneke bikin têdikoşin!

Em bi hemî tekoşînên trans, înter û ne du-alî re piştgiriya xwe nîşan didin. Lewre tenê em dikarin biryara zayenda xwe bidin. Em naxwazin gorî dirûvên xwe bîn nasandin, gorî vê yekê tevbigerin û kincan li xwe bikin. Û ji ber vê yekê tu kes nikare êrîşê me bike û gotinan bibêje. Pêdiviya me bi ewlekariya cis-mêran nîne. Em dixwazin dawî li şidetê bê. Êrîşa li ser kesekê ji me êrîşeke li ser me hemiyan e!

Em bi xwe biryar didin kîngê û bi kê re seks dixwazin û emê ji kê hez bikin. Da ku em karibin biryara ser bedenên xwe bi xwe bidin, em têdikoşin! Em bi xwe biryar didin, em kîngê dixwazin ducanî bibin an jî betal bikin.

Emê êrîşên cudakariyên nijadperest û zayendperest nepejirînin. Ne xema me de ye, hûn navên me dikarin bêjin an na, emê gorî we tevnegerin!

Em ji bo civakeke ku tê de her kes bi azadî dikare tevbigere û tu kes\* nayê asteng kirin têdikoşin. Di vê civakê de jinên penaber û an jî astengdar, lezbiyen, ne-duali, kesên trans û înter xwedî mafê mayîneke bi ewlehî û jiyaneke bi rûmet in!

Em ji bo civakeke wêdetirê netewan û sînoran têdikoşin. Em hember antîfemînîzme, nijadperestiyê, antîsemîtîzmê, antîzîganîzmê, û nijadperestiya li dijî misilmanan şer îlan dikin!

### **Grev tê çi watê?**

Li Almaniyayê mafê me yê greva polîtîk tune ye. Ji ber vê yekê emê afirîner bin! Hevdû bigirin û xwe bi awayekî kolektîf nîşan bidin: Dest ji karê malê berdin. Xwe azad bikin. Karê betal bikin, ji dibistanê birevin. Neçin zanîngehê. Pêşmalkan li pacyan de daleqînin. Li cihê kar afîşan daleqînin. Qehwe çênekin. Makîna firaqan vala nekin. Ji dêl ve xwe bi rêxistin bikin. Civînên xwendekaran, karkeran, ciwanan, perwerdekarên û an jî komxebatên astengdaran li dar bixin. Bi hevalên xwe yê hevkar re, hevalên xwe re, dapîrên xwe re, dayikên xwe re, xaltî û xwîşkên xwe re biaxivin!

Em hemî dikarin roja 8ê Adarê bikevin grevê. Emê lînêrîna zarokan bi awayekî kolektîf bi rêxistin bikin, derkevin kolanan û qadên giştî bidest bixin. Werin em bi hev re wekî tekoşer\*ên berî me bi hemî amûrên xwe ji bo jiyaneke baş têbikoşin. Heta ku her roj bibe 8ê Adarê! Tevlî me bibe!

---

\* Zayenda te ne bedena te ye. Zayenda te pênasandina civakî ye. Ev \* vê yekê dide nasandin. Di vê çalakiyê de gelek derfet û pêdiviyên ku cis-mêr bînin cih jî hene: xwarin û vexwarin, lînêrîna zarokan, afîş çêkirin û hwd. Dixwazî piştgirî bidî me? Gelek baş e! Bi me re bikeve têkiliyê: [8m\\_hamburg@riseup.net](mailto:8m_hamburg@riseup.net).